Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :886 4-Tebax- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165



## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | ■ | Ç | ■ | N | Î | G | A | R |
| 2 | E | B | E | D | Î | ■ | A | ■ | E |
| 3 | ■ | Ê | L | ■ | S | O | R | A | N |
| 4 | G | ■ | P | K | K | ■ | A | ■ | Î |
| 5 | A | J | ■ | Î | ■ | K | N | K | ■ |
| 6 | ■ | Î | D | ■ | T | A | ■ | A | R |
| 7 | D | ■ | O | J | E | ■ | A | L | A |
| 8 | A | X | ■ | Ê | ■ | Î | R | O | ■ |
| 9 | X | W | E | ■ | E | N | Î | ■ | |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | ■ | | | ■ | | |
| 2 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 3 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 4 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 5 | ■ | | | ■ | | ■ | | | |
| 6 | | ■ | | | | | | | |
| 7 | | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 8 | | ■ | | | ■ | | | ■ | |
| 9 | | | ■ | | | | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Cînava pirsê ya ku tê wateya; li kû ye?... Birayê bavê mirov... Pirç
2. Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin... Deng, sewt
3. Danekî rojê... Du roj berî niha
4. Notayek... Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye
5. Peyva neyînî... Sedemkarê tevgerê, paldêr
6. Erkedarê ku di kêştiyan de xizmeta rêwiyan dike
7. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku weke sembola hêzê bi kar tînin... Agir
8. Notayek... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tinekirin
9. Baneşana kêfxweşiyê... Riya teng ya ku tenê bi piyan tê de tê meşandin

**JOR-JÊR**

1. Alî... Bajarekî me
2. Xem û keder
3. Encam, netîce
4. Genimê hêrayî... Kar û xebat
5. Bi soranî ‘av’... Paytexta Îtalyayê
6. Serokê rûhanî yê xaçparêzan... Ava qirêj ya piştî şûştinê
7. Stiranên li ser miriyan... Peyveke teşwîqkirinê
8. Dijbera jêr
9. Nexweşiyek... Keç... Ji wî/ji wê

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| Ajel | Lawir, candar, heywan. |
| Bûro (Fransî) | Nivîsgeh, odeya xebatê, ofîs. |
| Bûrokrasî (Fransî) | 1.Koma rêveberên dewletê yên asta wan li jorê.<br>2.Meşandina karê rêveberiyê: Ji ber bûrokrasiya giran plana me nemeşiya. |
| Fermanber | Kesê di karê dewletê de bi mûçeyê dixebite, memûr, mûwezef. |
| Fon (Fransî) | Diravên ji bo bikaranîna karekî diyar hatîn cudakirin, çavkanî: Ji bo piştgiriya mamosteyan fon hat veqetandin. |
| Kargeh | Ciyê ku kar lê tê kirin. Paloke, Fabrîqe, memele. |
| Karmend | Xwediyê kar, karbidest. |
| Moçik | Tasa ji dar yan jî axê hatî çêkirin. |
| Mûçe | Mehaneya ji bo kesên kar dikin tê dayîn. Meaş. |
| Nakokî | Tiştên dijberî hev: Di navbera wan de nakokî derket. |

# Amerîka berhemên ji Iraqê hatîn dizîn radest dike



**Serokê Amerîka Joe Bîden fermana radestkirina 17 hezar berhemên dîrokî yên di dema dagîrkirina Iraqê de (2003) hatîn dizîn da. Dîroka piraniya wan berheman digihe 4 hezar salan berê.**

Wezîrê Çandê yê Iraqê ragihand ku wê Amerîka 17 hezar berhemên arkeolojîk yên 4000 sal berî niha yên di salên dawî de hatîn talankirin radest bike.

Wezîr Hesen Nazim diyar kir ku berhemên werin radestkirin yên herî kevin û girîng in û got, ev encama xebata çend mehan ya rayedarên Iraqê û sefareta wan ya li Waşîngtonê ye.

17000 berhemên dîrokî wê bi balafira Serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazimî roja Pêncşemê pê vegere bên veguhestin.

Li gorî daxuyaniya Wezareta Çandê ya Iraqê piraniya berheman “bazirganiya dema Sumeran” ku yek ji şaristaniyên herî kevnar ya Mezopotamya ye belge dikin.

### BERHEMÊN KU DESTANA GILGAMÊŞ VEDIBÊJIN

Li gorî Wezareta Dadê ya Amerîka di nava berhemên ku wê werin radestkirin de dibe ku tabletek bi gêçê ya bi şeklê kama ya 3500 salî be û weke “Hebûna çandî ya hatî dizîn” tê pejirandin be ku bi rengekî derqanûnî ketiye bazara hunerî ya Amerîka.

Tableta ji gêçê weke yek ji berhemên wêjeyî yê herî kevnar ên mirovatiyê tê pejirandin ku helbestên têkildarê vegotina çîroka lêgerîna bêmiriniyê yê şahê herî bihêz ê mezopotomaya “Destana Gilgamêş” e.

### BI DEHÊN SALAN E BERHEMÊN DÎROKÎ TÊN TALANKIRIN

Piştî roxîna rejima Seddam Hisên ya sala 2003’an li seranserê welat qadên arkeolojîk zererek mezin dîtin. Bêxwedî man û mûze hatin talankirin.

Ji mûzeya neteweyî ya li Bexdayê nêzî 15000 berhem hatin dizîn. Wezareta Çandê ya Iraqê di daxuyaniya xwe de got, em hêvîdar in ku emê di demeke nêzîk de berhemên xwe yên mayîn bi taybetî yên li Ewropa vegerînin.” *ANF*

# Tûrikê Çîvanokan

***Di tûrikê me de îro sirûda li ser metê heye. Zarok çawa ku ji dapîrên xwe hes dikin wisa ji metikên xwe jî pir hes dikin. Metik jî wisa ji birazayên xwe hes dikin. Bi gotinan her tim xwe dikin gorî serê wan. Metik gelek caran birazayên xwe yên piçûk dibin cem xwe û bi rojan li cem xwe dihêlin.***

## METÊ

Lê metê lê lê metê
Mala metê li Binxetê


Ji Binxetê hat Serxetê
Xiftanê sor pir li te tê

Mam û metik hev re hatin
Mîna roja nûhilat in

Oçkê metê tev rîşî ne
Li ser desta wek poşî ne

Karê metê tevn û teşî
Hem dirêse hem dimeşî

Metê destar tim li ber e
Kofî kesk û sor û zer e



# Mezlûm Ebdê: Vegerandina koçberan erkê me yê sereke ye



Mezlûm Ebdê careke din soz da ku wê koçberan vegerînin herêmên wan û têkoşîna li dijî DAIŞ`ê bidomînin. Herwiha got divê li ser asta navneteweyî piştgiriya QSD`ê bê kirin da erkên xwe bîne cih.*R-5*





# `Ronahî` rojnameya yekê li ser asta Rojava



Ragihandin di her alî de deng û rengê civakê ye. Di roja me ya îro de her kes bi riya ragihandinê dengê xwe digihîne cîhanê. Gelê kurd jî bi avakirin û pêşxistina ragihandinê, dagîrkirina Kurdistanê û binpêkirina mafên xwe ji cihanê re ragihand. *R-6*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 886 4-Tebax- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî



# KU TU NABÎ GUL NEBE STIRÎ JÎ

## Divê PDK dev ji hevkariya xwe ya bi dewleta tirkî re berde

KCDK-E bi daxuyaniyekê bang li PDK`ê kir ku dev ji hevkariya xwe ya bi dewleta tirkî re berde. Herwiha got, divê têkildarî koma gerîla ya agahî jê nayê girtin, daxuyaniyeke pêbawer bide.

» * KCDK: Em Kurdên li Ewropa û dostên xwe bang li PDK’ê dikin ku dawî li hevkariya xwe ya bi dewleta tirkî re bîne û têkildarî koma gerîla ya winda bilez bersivekê bide.*R-4*



### Hebûna PKK`ê hebûna gelê Kurd e

**Hêvî Seyîd:**


* Divê hikûmeta başûrê Kurdistanê li dîrokê vegere. Gotina pêşiyan e: `Dijminê bava nabe dostê lawa.`
* Divê hikûmeta başûrê Kurdistanê baş bizane ku dewleta tirkî gelê Kurd tev kiriye hedefa xwe, ne PKK tenê.

**Suheyla Osman:**

* Heta mirinê emê piştgiriya gerîlayên xwe bikin, lewra yên Kurdan ji qirkirinê xilas bike ew in. Bila kesek xwe nexapine.

***Çawa dijminê hov, ji bo qirkirina me bi şev û roj dixebite, divê em jî li hemberî planên wan bi şev û roj li ser piyan bin û bixwebitin. Heta xaka me di destê dagîrkeran de be, divê xew bi çavê me nekeve.** *R-3*

# Haşim El-Cerba: Rêveberiya Xweser yekîtî ava kir û Sûriye xurt kir



» Ji şêxên eşîra Şemer Haşim Silêman El-Cerba diyar kir ku projeya Rêveberiya Xweser hêza Sûriyê parast û got, divê her kes wê mînak bibîne. Herwiha got, daxuyaniyên Şamê ne rast in û ji bo propagandaya çapemeniyê ne.”*R-4*

# `Şoreşa Rojava ji bo min derfeteke zêrîn e`



» Şoreşa Rojava di her qada civakê de bû bingehê pêşxistina rola jinan. Narîman Evdikê diyar kir ku, wêrekiya nivîsa çîrokan ji şoreşa Rojava girtiye. *R-3*

# Teşî



» Çawa jinê jiyan ava kiriye û riştiye, amûrên ji bo avakirin û hêsankirina jiyanê jî despêkê jinê çêkirine û bi wan kar kiriye. Teşî jî amûrek e ku bi destê jinê hatiye çêkirin û kar pê hatiye kirin. Amûreke malê ye û berî bi hezarê salan hatiye çêkirin. Jinê ji bo pêwîstiyên malê bi teşiyê hirî riştiye û ew hirî kiriye cilûberg. *R-7*

# Rojava siyaseta PDK`ê şermezar kir

**Bi hezeran şêniyên bajar û bajarokên kantona Qamişlo ji bo şermezarkirina êrişên dewleta tirkî ya faşîst yên ser başûrê Kurdistanê daketin qadan û bang li PDK`ê kirin ku dev ji hevkariya dewleta Tirkan berde.**

Şêniyên kantona Qamişlo bi meşekê êrişa çekdarên PDK`ê yên ser gerîla yên li herêma Xelîfan ya başûrê Kurdistanê şermezar kirin û gotin divê têkoşîn li dijî siyaseta PDK`ê û dewleta Tirkan xurt bibe.

Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo bi armanca şermezarkirina êrişên dewleta Tirkan yên ser başûrê Kurdistanê û kiryarên PDK`ê meşek lidar xist. Meş ji çerxeriya El-Şerq ya rojhilatê bajarê Qamişlo dest pê kir û ber bi çerxeriya Sonî ve çû.

Di mitînga piştî meşê de Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo Mehsûm Hesen got, dewleta Tirkan xwe li ser qirkirina gelên Rojhilata Navî, ava dike. Ji ber wê divê hikûmeta başûrê Kurdistanê û PDK ji tevger û xiyaneta li gelê xwe, şerm bikin.



DÊRIK

Bi heman armancê li Dêrikê jî meşek hat lidarxistin. Meşê ji qada Azadî dest pê kir û ber bi dêra Marşimonî ve çû.

Di meşê de pankartên "Meşa rûmetê li dijî dagîrkerî û xiyanetê" û "gerîla paşroj û rûmeta mirovane" hatin vekirin.

Di mitînga piştî meşê de endamê PYD`ê Hisên Remedan êrişên dewleta Tirkan yên ser başûrê Kurdistanê û hevkariya PDK`ê ya bi dewleta Tirkan re şermezar kir û wiha axivî: "Di vê pêvajoyê de tê xwestin ku kongreya neteweyî ya kurdistanî li hemberî komployên li dijî gelê Kurd were lidarxistin."

TIRBESPIYÊ

Şêniyên navçeya Tirbespiyê jî bi meşekê hevkariya PDK`ê ya bi dewleta Tirkan re şermezar kir. Di meşê de êrişên PDK`ê yên ser gerîla hatin şermezarkirin û hat gotin sûcên bi vî awayî xizmeta dewleta Tirkan dikin.

Di mitînga piştî meşê de ji rêveberên Kongreya Star ya navçeya Tirbespiyê Nalîn Temo wiha axivî: "Hikûmeta Erdogan bi her rêbazê hewl dide şoreşa Rojava û yekîtiya kurdî têk bibe. Em bang li PDK`ê dikin ku dev ji helwesta xwe ya ku xizmeta dewleta Tirkan dike, berde."

Ji rêveberên meclisa navçeya Tirbespiyê Nesîm Mûrad jî ev xal anî ziman: "Sedema sereke ji têkbirina şoreşên kurdî ku di nava dîrokê de hatin kirin, xiyanet bû. Divê gelê Kurd li hemberî siyaseta xiyanetê rabin."

ÇILAXA

Bi durişma "Ji şer re na, dem dema yekîtiya neteweyî ye" gelê navçeya Çilaxa meşek li dar xist û êrişên PDK'ê û dewleta Tirkan yên ser herêmên gerîla şermezar kir.

Di mitînga piştî meşê de ji rêveberên Hêzên Parastina Civakê ya navçeya Çilaxa, Mihemed Ebas got, êrişên PDK'ê yên ser şervanên azadiyê ne tesadufî ne û wiha axivî: "43 sal in êrişên li dijî gelê Kurd ranawestin, tevî wê jî serî danayne û her tim li ber xwe dide. "

Mihemed Ebas got, eer bê xwestin, emê zarokên xwe bişînin çiyayan da ku bibin alîkar û piştgiriyê bidin şervanên azadiyê li dijî dewleta Tirkan."

TIL BIRAK

Meclisa navçeya Til Birakê jî bi heman armancê meşek organîze kir. Meşê ji çerxeriya şehîdan dest pê kir.

Di çalakiyê de hevseroka Meclisa Navçeya Til Birak Emîne Xelêf êrişa PDK'ê yên ser gerîlayên li herêma Xelîfan şermezar kir.

Emîne diyar kir ku êrişên dewleta Tirkan ya dagîrker yên ser başûrê Kurdistanê berdewamiya sûcên dagîrkeriyê yên qutkirina ava li ser bi milyonan sivîlên li bakur û rojhilatê Sûriyê û xerabkirina gorên şehîdan e.

TIL KOÇER

Bi sedan şêniyên navçeya Til Koçer jî ji pêşiya parka rêber Ocalan dest bi xwepêşandanê kirin. Welatî di kolana sereke ya navçeyê re geriyan û durişmên şermezarkirina êrişên dagîrkeriya tirkî ya li başûrê Kurdistanê avêtin.

Di çalakiyê de bi navê Meclisa Navçeya Til Koçer endamê meclisê Salih Mihmêdî wiha axivî: "Em kiryarên dermirovî yên dewleta Tirkan yên bi hevkariya PDK`ê şermezar dikin." Mihmêdî diyar kir ku armanc ji hevkariya PDK û AKP`ê ew e ku şer di nava gelan de derkeve. Mihmêdî axaftina xwe wiha qedand: "Em li kêleka gerîla ne, lewra ew ji ber tevayiya gelê Kurd ve şer dikin."

*ANHA*

## Li Misirê li herêma Sîna 89 terorîst hatin kuştin



**Hêzên Çekdar yên Misirê ragihandin ku hêzên wan li bakurê Sîna 89 terorîstên "Xeternak" kuştine û gelek alavên wan yên leşkerî desteser kirine.**

Hêzên Çekdar yên Misrê bi daxuyaniyekê ragihand ku li herêmên bakurê Sîna 98 terorîst kuştine û bi "Xeternak" bi nav kirin.

Di daxuyaniya Fermandariya Giştî ya Hêzên Çekdar yên Misrê de wiha hat gotin: " 73 tifingên otomatîk, 140 cercûr, 5 hezar û 606 guleyên bi eyarên cuda, 34 telefonên bêtêl, balafireke bêpîlot ya bi kamîre, dûrbînên ji bo dîtina bi şevê, laptopek, gelek telefonên destan û gelek pere hatin desteserkirin. "

Herwiha hat ragihandin ku hêzên çekdar li enî û riyên sereke 404 mayîn , 4 kemberên teqîner, 59 motorsîklet û 52 erebeyên terorîstan bêbandor kirin û 13 tûnel roxandin.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Di çarçoveya rêzetedbîrên ewleyiyê de, hêzên ezmanî bi hevkariya parêzvanên sînor dema ku terorîstan hewl dida bikevin herêmên qedexe yên li sînorê rojava û başûrê welêt, derbe kirin, di encamê de 200 erebe roxandin ku hin ji wan çek û cebilxane di wan de bûn. "

Ji Sibata 2018`an ve artêşa Misrê li dijî terorîstan operasyonên leşkerî pêk tîne.

*ANHA*

## YPG`ê idîayên dewleta tirkî derew derxistin

**Navenda nûçeyan-Qamişlo**


**Yekîneyên Parastina Gel, idîayên Wezareta Parastinê ya dewleta tirkî yên kuştina 3 şervanên YPG`ê li herêmên dagîrkirî derew derxistin.**

Wezareta Parastinê ya dewleta tirkî idîa kiribû ku li herêmên dagîrkirî 3 şervanên YPG`ê hatine kuştin.

Têkildarî mijarê Yekîneyên Parastina Gel (YPG) li ser hesabê xwe yê tiwîtterê wiha got: "Wezareta Parastinê ya dewleta tirkî di çarçoveya şerê taybet de belavkirina nûçeyên derew didomîne.

Li herêma navborî ti tevgerên hêzên me çênebûne û ev nûçe dûrî rastiyê ye."

## Aram Hena bû berdevkê QSD'ê



**Di civîna salane ya meclisên leşkerî yên QSD'ê de, Fermandarê Meclisa Leşkerî ya Suryanî Aram Hena wek berdevkê QSD'ê yê nû li şûna Kîno Gabrîel hat hilbijartin**

Di civîna salane ya meclisên leşkerî yên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ku li Hesekê li dar ket de, Aram Hena li şûna Kîno Gabrîel bû berdevkê QSD'ê.

Piştî axaftina Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê û Fermandarê Hêza Erkên Hevbeş- Operasyona Ezim El-Selib general Paul t.Calvert, civînê ji ragihandinê re girtî dewam kir û rêzikaneme û xebatên meclisan hatin nîqaşkirin.

Piştî nîqaşan, Fermandarê Meclisa Leşkerî ya Suryanî Aram Hena wek berdevkê QSD'ê yê nû li şûna Kîno Gabrîel hat hilbijartin.

*ANHA*

## HAT`ê li Dêrazorê 4 çeteyên DAIŞ`ê girtin

**Hêzên Taybet yên Hêzên Ewlekariya Hundir 4 endamên şaneyên DAIŞ`ê girtin û miqdarek çek û alavên leşkerî yên bi wan re desteser kirin.**



Navenda Ragihandinê ya Hêzên Ewlekariya Hundir li ser malpera xwe ev agahî parve kir: "Hêzên Taybet (HAT) roja Yekşemê li gundê El-Ezbe yê rojhilatê Dêrazorê operasyonek li dar xist. Di encamê de 4 endamên şaneyeke DAIŞ`ê ku li gund û bajarokên Dêrazorê bûyerên kuştinê pêk anîbûn, hatin girtin.

Meha borî jî hêzên me şaneyeke terorîst girt. Herwiha li ser roya bajarokê El-Bisêra ku çûnhatina welatiyan lê zêde ye, rextekî bombebarkirî berî ku biteqe, bêbandor kirin."

*ANHA*

## Şehîd Hisên El-Ziêr li Tebqa hat veşartin

**Şêniyên Tebqa cenazeyê şervanê Meclisa Leşkerî ya Babê Hisên Taha El-Ziêr ku 30'yê Tîrmehê li Minbicê şehîd bûbû, spartin axê.**

Şêniyên Tebqa cenazeyê şervanê Meclisa Leşkerî ya Babê Hisên Taha El-Ziêr ku li ser erkê xwe li bajarê Minbicê şehîd bûbû bi merasimekê li goristana Şehîdan veşartin.

Merasimê bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir.

Di merasimê de endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Tebqa Mihemed Ereb sersaxî ji malbata şehîd re xwest û soza şopandina xeta şehîdan da.

Hevseroka Desteya Karûbarê Civakî û Xebatê ya Rêvberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Hêvîn Îsmaîl jî soza domandina parastina ewleyiya herêmê da û bi van gotinan xîtabî Erdogan kir: "Emê li dû hev şehîdan bidin heta serkeftinê pêk bînin û terorê li xaka Sûriyê têk bibin."

Di berdewama merasimê de, bi navê Meclisa Leşkerî ya Babê Yûsif Erîma jî wiha got: "Me bi hezaran şehîd dan û îro em şehîdekî din didin da ku azadî û aştî li welatê me pêk were."

Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Tebqa Ebdulhekîm El-Hisên nasnameya şehîd xwend û radestî malbatê kir.

Cenazeyê şehîd di nava durişman de spartin axê.

*ANHA*



# Teşî

**Hediya HISÊN-Qamişlo**

Çawa jinê jiyan ava kiriye û ristiye, amûrên ji bo avakirin û hêsankirina jiyanê jî despêkê jinê çêkirine û bi wan kar kiriye. Teşî jî amûrek e ku bi destê jinê hatiye çêkirin û kar pê hatiye kirin. Amûreke malê ye û berî bi hezarê salan hatiye çêkirin. Jinê ji bo pêwîstiyên malê bi teşiyê hirî ristiye û ew hirî kiriye cilûberg.



TEŞÎ JI ÇI ÇÊBÛYE?

Teşî darekî dirêjî gulover û zirav e. Ji dara ewsec, nebeq û sedir çêdibe. Li derdora 20cm ye. Di serê wê de jî perçeyeke gulover ji risas heye. Jin tayê hiriyê lê digerînin û dirêsin. Piştî ta dihat rêsan ew ta li hev digerandin dikirin girofik û cil û pêdeviyên xwe pê çêdikirin.

KARÊ TEŞIYÊ KEDA JINAN

Bêguman teşî li her gundî û li her malê hebû. Di deme jêkirina hiriya pez de, jinan ew hirî dişûşt, ziwa dikirin, diweşandin û bi destan ji hev vedikirin. Pişt re komek ji hiriyê zirav dikirin û li teşiyê digerandin. Teşî piranî demsala bihar û hevînî bi kar dianîn. Di dema valabûnê de jinên gund li hev kom dibûn û her yekê bi teşiya xwe hem kar dikir hem suhbet dikirin. Jinan bi tayê teşiyê cil, tentene û hin pêdiviyên malê çêdikirin. Jina ku gelek berhem ji karê teşiyê çêdikir, ew jin bi jina jêhatî dihat naskirin. Çimkî ristina hiriyê bi teşiyê karekî ne hesan bû.

Piraniya cilên zarokan, cilên mezinan yên zivistanê, rehela bûkan, goreyên zivistanê, bi hiriya bi teşiyê hatî ristin dihatin çêkirin. Ji ber ku teşî amûreke xwezayî bû û bi kedeke mezin ew kar pê dihat kirin, pêdeviyên ku pê dihatin çêkirin jî pir xweşik û baş bûn. Cilên ku bi tayê teşiyê dihatin çêkirin bi salan nediqetiyan. Bi taybetî li gel Kurdan teşî gelek dihat bikaranîn, bi qedir û qîmet bû û çandeke pîroz bû. Lewra bûbû parçeyeke avakirina jiyanê ji bo wan. Lê mixabin, niha çawa jina ku di civakê de pêşeng û avakera jiyanê bû hatiye jibirkirin, herwiha berhem û amûrên wê yên despêka jiyanê ku bingehê teknik û teknolojîya niha ne jî, hatine jibîrkirin. Ji bo wê me xwast bi riya teşiya ku amûreke jiyanê bû, van amûrên ku bi destê jinê ji bo bingehê mirovayiyê hatine çêkirin, bîr bînin.



## Konê Reş evîndarê zimanê kurdî ye

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Helbestvan Selman Ebdo ku bi navê 'Konê Reş' tê naskirin, yek ji helbestvanên Kurd yên binavûdeng e. Selman Ebdo Sala 1953yan li gundê Doda yê bajarê Qamişlo ji dayîk bûye. Ji zaroktiya xwe ve ji guhdarkirina çîrokan hes dike. Bi taybetî çîrok û efsaneyên kurdî yên kevin. Ev jî wisa dike ku bibe evîndarê zimanê kurdî.

Helbestvan Konê Reş zaroktiya xwe li gundê Doda diqedîne. Pişt re ji bo berdewamkirina xwendina xwe berê xwe dide bajarê Qamişlo. Piştî ku li Qamişlo bi cih dibe dest bi nivîsandinê dike. Konê Şer dibêje, wê demê di mejiyê min de her tim pirsa 'Çima xwendin û nivîsandin bi zimanê kurdî nîne?' digeriya. Lê min ji pirsa xwe re bersiv nedidît.' Ji bo xwendina xwe bi dawî bike, payîza 1977 berê xwe dide Almanya, bajarê Frankfurtê. Lê ji ber bihabûna xwendinê, nikare berdewam bike.

BIRYARA NIVÎSANDINA BI ZIMANÊ KURDÎ

Dema dibîne ku zimanê kurdî, ne kêmî zimanên din e û kok û rehên zimanê wî xwe digihînin bi hezarê salan, herwiha rewa xwe ji ava çemê Dîcle û Firat distîne, bi çiyayê Cûdî, Barzan, Zagros, Toros û Agirî re mezin dibe, bi Nûh pêxember re geriyaye û herî dawî li Cizîra Mîr Şeref li dinayayê belav bûye, li Almanya biryara nivîsandina bi zimanê kurdî dide.

HESKIRINA WÎ YA WELAT WÎ VEDIGERÎNE WELATÊ WÎ

Helbestvan Selman Ebdo (Konê Reş) Ji ber heskirina welat, bihara 1978an vedigere rojavayê Kurdistanê û dest bi nivîsandina bi zimanê kurdî dike. Konê Reş pêşî dest bi çîroka dapîra xwe ya Ermen dike û pirtûk bi navê 'Geşta Êş û Janan' pirtûk derdikeve. Konê Reş heta niha di ser 25 pirtûkî re (helbest, pexşan, dîrok û roman) nivîsîne. Ev pirtûk li deverên weke Şam, Beyrûd, Stokholm, Amed, Stanbol, Hewlêr, Dihok û hwd. hatine belavkirin

KAR Û XEBATA HELBESTVAN

Tevî dîwana dawî ya bi navê 'Qamişlo-Pol: Helbest û Pexşan' ku Gulana 2020'an li Qamişlo derketiye, jimara dîwanên nivîsîn 10 in. Herwiha 3 dîwanên wî yên ji bo zarokan sala 1993yan li Beyrûdê derketine. Sala 1996an jî helbesta wî ya bi navê `Şagirtê Bedirxan im` derketiye.

Li aliyê din 3 dîwanên wî ji zimanê kurdî bi zimanê erebî hatine wergerandin. Ew jî ev in: Cûdî Çiyayê Mirada: Bi wergera Hejar Îbrahîm,



Şam/ 2004, Dara Çinarê: Bi wergera Îmad Elhesen, Şam/ 2006 û Gurzek Êş: Bi wergera Xalis Musewir, Qamişlo 2017.

## Her govendek çîrokek û her çîrokek dîrokek




**Bi beşdarbûna 16 komên govendê, Mihrîcana Dîlanan ya Ronahî Bawer ya 5'an li bakur û rojhilatê Sûriyê bi durişma "Her govendek çîrokek û her çîrokek dîrokek" li bajarê Hesekê dest pê kir.**

Mihrîcanê bi meşa bi durişma "Li dijî dagîrkerî û xiyanetê meşa azadî û rûmetê" hatî organîzekirin ji pêşiya Navenda Çand û Hunerê ya Xabûr ya taxa Miftî dest pê kir. Bi dehan endamên Tevgera Çand û Hunerê ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi cilên xwe yên folklorî beşdarî meşê bûn û li dijî êrişên dagîrkeriyê durişim avêtin.

Piştî meşê dayîka şehîd Ronahî Bawer, Emîna Hisên mihrîcan li beşdaran û tevayiya cangoriyên azadiyê pîroz kir û got, lidarxistina mihrîcanê di demekê de ku komplo li ser herêmê tên plankirin, serkeftina tevayiya gelan e. Berpirsên mihrîcanê malbata şehîd Ronahî Bawer xelat kir.

Bi navê Tevgera Çand û Hunerê Nesrîn Botan jî bixêrhatina beşdaran kir û diyar kir ku mihrîcan wê sê rojan dewam bike, wê dîlanên herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ji Tebqa heta Dêrikê werin pêşandan.

Bi navê komîteya amadekar ya mihrîcanê Dîma Elî, lidarxistina mihrîcnê li rêber Abdullah Ocalan, cangoriyên azadiyê û gerîlayan pîroz kir û got, armanca mihrîcanê vejandina folklora gelên herêmê ye.

Piştî axaftinan, belgefilmeke li ser têkoşîna şehîd Ronahî Bawer hat pêşandan. Çalakiya roja yekê ya mihrîcanê bi gerandina dîlanên follklorî yên bakur û rojhilatê Sûriyê bi dawî bû.

*ANHA*




## 'Tirsa tinebûna pîşeyê çêkirina kilaşên Hewraman heye'

Yek ji taybetmendî û çanda devera Hewreman ya başûrê Kurdistanê çêkirina pêlavên kilaş e. Hewramanî wergirtina kilaşan weke çandekê dibînin û serbilindiyê pê dikin. Lê niha tirsa li ser tinebûna kilaşên Hewraman heye û her ku diçe kesên kilaşan çêdikin kêm dibin.




Osman Hacî Qadirê Tewêleyî ku ser 45 salî re ye pêlavên kilaş çêdike, têkildarî metirsiya tinebûna pîşeyê çêkirina kilaşan ji Rojnews'ê re wiha axivî: "Niha pîşeyê çêkirina kilaşan ji destê me derketiye. Lewra debara me pê nabe û bihayê wan gelek erzan bûye. Li vê deverê em êdî nikarin wek pîşeyekê lê temaşe bikin. Ji ber ku ji sibehê heta êvarê em bi çêkirina kilaşekê ve mijûl dibin, dema em difiroşîn bi pereyên wê kîloyek bacanên sor nayê."



Osman Hacî da zanîn her tişt li ciyê xwe bisûd e û diyar kir ku ketina nirxê Tûmenê Îranê bandoreke mezin li ser xelkê deverê û bihayê kilaşan jî kiriye. Li ser sedemên metirsiya nemana hosteyên çêkirina kilaşan jî Osman wiha got: "Hosteyên ku ji berê ve vî karî dikirin, zarokên xwe fêr nekirin ku pîşeyê bavê xwe berdewam bikin. Sedemeke din jî ew e ku bi vî pîşeyî debara jiyanê nabe."

Osman Hacî da xuyakirin ku piştî ku ew nemînin, dibe ku pîşeyê çêkirina kilaşan jî nemîne, lewra neviyên wan êdî naxwazin fêrî vî pîşeyî bibin.

Hosta Osman diyar kir ku berê pîşeyê wan baş bû û li gel çar hosteyên din kilaş çêdikirom pê re nedigihiştin, tev dihatin firotin.

Hoste Osman Hacî got, niha bi vî pîşeyî debara me nabe, lewra niha bihayê deh cot kilaş nake bihayê cotek kilaşên berê. Dibe ku ev pîşe bi temamî tine bibe, lewra bi mirina her hosteyê vî pîşeyî re êdî kesek li şûna wî dewam nake."

Osman Hacî herwiha da zanîn ku eger hikûmet bikare pêşî li hatina kilaşên Îranî bigre û bihayê kilaşan were girankirin, dibe ku welatî zêdetir giringiyê bidom vî pîşeyî.

*ROJNEWS*

# `Ronahî` rojnameya yekê li ser asta Rojava

**Ragihandin di her alî de deng û rengê civakê ye. Di roja me ya îro de her kes bi riya ragihandinê dengê xwe digihîne cîhanê. Gelê kurd jî bi avakirin û pêşxistina ragihandinê, dagîrkirina Kurdistanê û binpêkirina mafên xwe ji cihanê re ragihand.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Destpêkirina rojnemevaniya kurdî, ji bo Kurdan dîrokeke nû bû. Rojnemevaniya kurdî di demeke kurt de rola xwe lîst û li cihanê jî bandora xwe kir. Li cihanê cara yekê jinê di çapemeniya azad ya kurdî de roleke pir girîng lîst. Li cihanê jî cara yêkê di ragihandina kurdî de ajansa jinê ya bi navê JINHA hat vekirin.
22`yê Nîsana 1898an bi pêşengiya Mîqdat Mîthat Bedirxan rojnameya kurdî ya yekê bi navê 'Kurdistan' li Qahîre derket. Bi destpêkirina şoreşa Rojava re rojnameya Ronahî jî 16`ê Cotmeha 2011`an dest bi weşanê kir. Rojname bi zimanê erebî û kurdî derdikeve. Erebî hefteyê pênc, kurdî du rojan derdikeve. Mijarên rojnemeyê siyasî çandî û civakî ne. Di hundirê rojnemeyê de kovara Mizgîn jî 15 rojan carekê derdikeve. Ev kovar taybet ji bo zarokan e.
Piştî destpêkirina rojnameya Ronahî bi deh salan, bi keda



endamên rojnemeyê û bi saya şehîdan, 1`ê vê mehê jimara hezarî hat weşandin.

**`Me bi jimara sifir dest bi weşana xwe kir`**

Derbarê mijarê de endamê rêveberiya rojnameyê Ebdurehman derketina jimara hezarî li gel û li tevayiya şehîdên Kurdistanê pîroz kir û wiha berdewamî da gotinên xwe: "Tevgera Azadiya Kurdistanê dema dest pê kir, rengekî nû ji rengê ragihandinê bi xwe re ava kir. Herwiha fikir û hişmendiyeke nû di aliyê ragihandinê de da avakirin û hêz û artêşeke nû ji rojnamevanan re çêkir. Ji wê demê ve gelek saziyên ragihandinê hatine avakirin. Lê piştî şoreşa Rojava



karê ragihandinê pirtir bûye û rola wê di şoreşa Rojava de rojbiroj mezintir dibe. Yek ji wan saziyên bi şoreşê re hatîn avakirin saziya me ya rojnama Ronahî bû. Rojname sala 2011an li bajarê Helebê hat damezirandin. Wê demê me bi jimara sifir dest bi weşana xwe kir. Niha jî jimara rojnamê ya hezarî hat derxistin. Ev ji bo me û ji bo tevayiya rojnamevanên Kurd gavege pîroz e."

Ebdurehman got, dema rojname hat avakirin şeş hevalên welatparêz tê de kar dikirin û wiha domand: "Van hevalan ji tinebûnê saziyek ava kir û bûn hêviya gelê xwe. Destpêkê erebî û kurdî bi hev re di yek jimarê de derdiket. Lê niha her beş serwîsa wê heye û serbixwe tên weşandin. Adara 2013 rojneme ji Helebê hat Qamişlo û bi vê re karê rojnemeyê zêdetir bû û me gelek gavên baştir avêtin. Destpêkê rojneme hefteyê carekê derdiket, lê sala 2018an biryar hat dayîn ku hefteyê pênc rojan derkeve. Ji van pên rojan hem ya eredî û hem jî kurdî du rojan kaxiz derdikeve."
Ebdurehman bal kişand ser zor û zehmetiyên rojnamevaniyê û got, ji destpêka rojnamevaniya kurdî heta roja îro heman êriş û astengî li dijî derxistina heqîqetê dewam dikin. Heta niha jî êrîşên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser ragahandina kurdî dewam dikin. Bi taybetî salên dawî rojnamevan bi awayekî hovane hatin kuştin.
Endamê rêveberiya rojnameyê Ebdurehman her du şehîdên rojnameyê Rênas û Kada bîr anîn û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Şehîd Rênas û Kada di rojnemê de pir ked dan. Dema em jî kar dikin, em dizanin ku bi ked û berxwedana van hevalan ev derfetên kar ketine destê me. Em her du şehîdên xwe bîr tînin û dibêjin emê şopdarên xeta we bin."

# Xwedîkera heywanan: Bila şaredarî erkê xwe pêk bîne

**Gul Bozan ya li Mêrdînê bi firaxeke av û xwarinê ajalên li derve xwedî dike da zanîn ku bêwijdaniyeke mezin li ser heyeanan tê kirin û got, bila şaredarî erkê xwe bi cih bîne.**

Yek ji zindiyên ku herî zêde di nava şert û mercên zehmet de dijîn heywanên di nava bajaran de ne. Mirovan qadên jiyanê yên wan ji destên wan derxistin û ew jî di nava bajaran de li dijî şidet û işkenceya mirovan hewl didin bijîn. Di aliyê tendirustiya wan de jî şaredarî û walî berpirsyar in. Lê belê erkê xwe bi cih naynin. Li gel vê yekê Gul Bozan ya her roj bi xwarin û vexwarina ku distîne kuçe bi kuçe digere û heywanan xwedî dike, got, divê em bi nan û avê wan xwedî bikin."

**Kuçe bi kuçe digire û heywanan xwedî dike**

Gul Bozan her roj bi xwarin û vexwarina ku distîne kuçe bi kuçe digere û heywanên bêxwedî xwedî dike. Her roj vî karî dike û li gorî ku dibêje her roj 20-25 heywanan xwedî dike. Gulê di vê mijarê de diyar kir ku tişta dike erkê her mirovî ye û wiha berdewamî da axaftina xwe: "Ajel jî zindiyên vê cîhanê ne. Divê em mirov jî bi wî çavî temaşe bikin. Me weke zindiyên ku difikirin qadên jiyana wan desteser kirine. Me ew birçî hiştine û ji jiyana xwezayî qut kirine. Ne zimanê wan heye ne jî fêm dikin. Pêwîst e em hemû destên xwe daynin ser wijdana xwe û ji wan re bibin alîkar. Pêwîst e em bi nan û avê wan xwedî bikin."

**'Şideteke mezin li ser heywanan tê kirin'**

Gulê di dewama axaftina xwe de wiha got: 'Eger em alîkariya heywanan nekin jî pêwîst e em dernarû wam de bêwijdaniyê nekin. Lewra ez dibînim ku em di binê navê olê de zordariyeke mezin li wan dikin. Hinek kes dibêjin dema mirov destê xwe bide heywanan guneh e. Hinek kes jî dibêjin heram in. Çima wisa dibêjin? Heywan jî weke me zindî ne. Derveyî sûdê zerera wan çênebûye. Lê em zerrê didin wan. Eger hûn dest nedin jî dest dirêj nekin, zordestî û işkence nekin."

**'Bila şaredarî erkê xwe bi cih bîne'**



Gulê bal kişand ser bicihneanîna erkê şaredarî û walîtiyê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Di mijara heywanan de walî, şaredarî û her mirov berpirsiyar in. Weke hinek mirovan şaredarî û walî jî erkê xwe bi cih naynin. Bila şaredarî erkê xwe bi cih bîne. Gelek heywan nexweş dikevin yan jî laşê wan ji ber lêxistinê zererê dibîne. Di vî alî de jî pêwîst e cihê heywanan hebe ku bên dermankirin û xwedîkirin. Li cihekî weke Mêrdînê ku heywanên bêxwedî lê zêde ne ji bo heywanan cihek tenê heye. Ew cih jî baş karê xwe nake. Em bang li tevayiya berpirsiyaran dikin ku erkê xwe bînin cih. Li gel wê jî pêwîst e welatî pirtir hestiyar nêz bibin. Parastin û xwedîkirina heywanên bêxwedî erkê me hemûyan e."
***JINNEWS***

# Daristanên dinyayê dişewitin

**Ji destpêkirina demsala havînê ve li her dera dinyayê agir bi daristanan dikeve. Li Sîbîrya ya ku yek ji cihên herî sar yê dinyayê ye agir bi daristanê ket.**

Ev çend hefte ne herêma Sîbîrya ya Rûsya di nava agir de ye. Ji meha Gulanê ve li vê herêmê agir bi daristanan dikeve û agir nayê vemirandin.
Rêxitina Meteorolojî ya Dinyayê 26'ê Tîrmehê li ser twîtterê wêneyekî şewata daristana li rojhilatê Sîbîrya weşand. Di wêne de daristana 800 kîlometrekare dişewite. Li gorî daneyên Greenpaceyê ji ber şewata daristanan 3,2 milyon hektar qad bûye xwelî.
Li Tirkiyê jî li bajarên weke Edene, Antalya, Mêrsîn, Mûgla û Osmaniye şewata daristanan didome û heta niha 6 kes ji ber şewatê mirine.
Li bakurê Lubnanê jî çend roj in agir bi gir û baxçeyan ketiye. Welatiyên herêmê bi derfetên xwe hewl didin agir vemirînin.
Li bakurê rojhilatê Peloponez (Mora) ya nêzî bajarê Patrasê ya Yewnanistanê ji ber şewatê 20 xanî şewitîn û 8 kes birîndar bûn. Di 1'ê Tebaxê de 300 xebatkarên



îtfaiyeyê, 77 kamyon, 2 balefirên tefandina şewatê û 5 helîkopteran hewl didan agir vemirînin. Roja Şemiyê agir bi 58 deran ketibû.
Li Îtalya jî vê hefteyê li 800 cihan agir bi daristanan ket. Di dawiya hefteyê de li Sardînya 20 hezar hektar daristan, baxçeyên zeytûnan û erdê çandiniyê şewitîn.
***ANHA***

# Heyva Sora Kurdî 4 ton derman ji Rêxistina Mirovî ya Nehrî girtin

Heyva Sora Kurdî ji bo girtina derman di nava hewldanê de ye Rêxistina Mirovî ya Nehrî 4 ton ji cureyên derman û madeyên tibî di deriyê Sêmalka re ji bakur û rojhilatê Sûriyê re şandin. Alîkarî ji aliyê Heyva Sora Kurdî ve hat girtin.
Di dema girtina dermanan de, Hevserokê Heya Sora Kurdî ya herêma rojhilat Dr. Ehmed Şêxmûs ji ajnasa nûçeyan ANHA re da xuyakirin ku cara sisiyan e ku Rêxistina Mirovî ya Nehrî dermanan pêşkêşî Heyva Sora Kurdî dike.



Şêxmûs diyar kir ku miqdarê alîkariya hatî şandin li derdora 4 tonan e û piraniya wan ji madeyên dezenfektekirin û dermanên nexweşiyan jinan in.
Ehmed Şêxmûs spasiya Rêxistina Nehrî kir.
***ANHA***



# `Şoreşa Rojava ji bo min derfeteke zêrîn e`

**Şoreşa Rojava di her qada civakê de bû bingehê pêşxistina rola jinan. Narîman Evdikê diyar kir ku, wêrekiya nivîsa çîrokan ji şoreşa Rojava girtiye.**

**Dilîn EHMED-Qamişlo**

Berî şoreşa Rojava ji ber siyaseta desthilatdaran, di her qada civakê de rola jinan hatibû tinekirin. Bi destpêkirina şoreşê re bi saya tevgera demokratîk, jin bû pêşenga têkoşîna azadiyê û di her qada jiyanê de xwe bi cih kir. Niha jin li Rojava di qada leşkerî, siyasî, civakî û çandî de pêşeng e. Bi taybetî jinan cihê xwe di qada çand û hunerê de girtiye, lewra jin parêzvana çanda civakê ye.
29ê Tîrmeha 2021ê bi pêşengiya Desteya Çand û Hunerê ya bakur û rojhilatê Sûrî li Navenda Çand û Huner ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo, bi durişma "Pirtûk Rehjena Jiyanê Ye", Pêşangeha Şehîd Herekol ya pirtûkan ya pêncan hat vekirin. Ji herêmên bakur û rojhilatê Sûrî bi sedan rewşenbîr, nivîskar, siyasetmedar, endamên saziyên civaka sivîl û bi sedan heskiriyên çand û nivîsê tevlî vekirina pêşangehê bûn. Pêşengeh heta 5`ê Tebaxê dewam dike. Di vê pêşangehê de jî jin di her alî de cih digire û pêşengiyê dike. Herwiha rengê niviskarên jin jî di vê pêşangehê de diyar bû. Li gorî salên din jimara niviskarên jin di pêşangehê de zêde ye.

**Armanc, piştgirî û xurtkirina moral e**

Cîgira Desteya Çandê ya bakur û rojhilat Sûrî Ronahî Hesen li ser rol û girîngiya jinan ya di pêşangehê de wiha axivî: "Armanca me ya sereke ya vekirina vê pêşangehê, xurtkirina moralê nivîskaran e. Bi taybetî nivîskarên jin. Salên destpêkê tevlîbûna nivîskarên jin kêm bû, ew hêz bi xwe re nedidîtin ku bi nivîsên xwe tevlî pêşangehê bibin. Lewra jin bi hestên xwe yên nazik tên naskirin. Lê tevlîbûna jinan di pêşangeha Şehîd Herekol ya Pirtûkan de, salbisal zêde dibe. Em jî bi vê pir kêfxweş dibin. Lewra jin dikare bi pênûsa xwe û bi hestên xwe, bibe dengê civakê. Ji ber wê em tevlîbûna jinan ya çalakiyên bi vî rengî, girîng dibînin."





Ronahî Hesen di dawiyê de bang li tevayiya jinên nivîsker kir ku, ji xwe bawer bin û derfetê nedin ti kesî moralê wan bişkînin.

**Şoreş Rojava şenseke zêrîn jê re derxist**

Çîrokanivîs Narîman Evdikê ya ji bajarê Serê Kaniyê, ku ji temenekî piçûk ve dinivîse, ji ber ku berî şoreşê, rola jinan di civakê de ji aliyê desthiladaran ve hatibû tinekirin, nikarî nivîsên xwe bike pirtûk û derxe. Piştî şoreşê bi taybetî piştî lidarxistina çalakiyên çandî, Narîman bi serbestî dest bi nivîsa çîrokan dike û pirtûkên xwe yên teybet derdixe.
Piştî lidarxistina Pêşangeha Şehîd Herekol ya Pirtûkan ya sisiyan, Narîman cesaretê ji şoreşa jinan



ya Rojava digire û bi pirtûka xwe ya taybet tevlî pêşangehê dibe.

**`Hêviyên xwe neşkînin, ji îradeya xwe bawer bin`**

Narîman Evdikê li ser tevlîbûna xwe ya pêşangehê wiha axivî: "Şoreşa Rojava ji bo min derfeteke zêrîn e. Min moralê xwe ye tevlîbûna pêşangehê û derxistina pirtûkê, ji berxwedana jinan ya şoreşa Rojava girt. Ji ber ku em jin pir hesas in, destpêkê tirsa derxistina pirtûkê û tevlîbûna pêşangehê hebû. Heta du salan ji darxistina pêşangehê ez wek xebatkareke jin tevlî dibûm. Min dixwest bi nivîs û çîrokên xwe tevlî bibim, lê min digot, ku ez çîrokên xwe binivîsim wê nerîna xelkê çi be? Gelo wê çi bêjin? Tirsa min ji vê hebû. Lê sala sisiyan ya pêşangehê ez bi pirtûkeke hevbeş tevlî pêşangehê bûm. Rast e çavê min mabû li rûyê kesê ku li pirtûka min meyze dikir, lê min ew tirs avêt û bi kêfxweşî her sal bi pirtûkeke xwe ya teybet, tevlî pêşangehê dibim."
Çîroknivîs Narîman Hesen di dawiya axaftina xwe de got, ji ber ku rola jinan di civakê de girîng e, pêwîst e têkoşîna xwe di her qadê de xurttir bike. Heta ku moral bidin tevayiya jinan. Heriwha banga min ji bo jinan ew e ku, ji îradeya xwe bawer bin û derfetê nedin tiştekî ku moralê wan bişkîne. Lewra jin xwediya hêzeke mezin e.

# Hebûna PKK`ê hebûna gelê Kurd e

**Navenda nûçeyan-Qamişlo**

**Li dijî êriş û dagîrkeriya dewleta tirkî yên li ser Herêmên Parastinê yên Medya û kiryarên PDK'ê yên bi dagîrkeran re, gelê Kurd bi çalakiyan nerazîbûna xwe nîşan dide û banga avakirina yekîtiya neteweyî dike.**

Li Zap, Avaşîn û Metîna yên Herêmên Parastinê yên Medya ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, gerîla bi têkoşîneke bêhempa li ber xwe didin. Ji 23`yê Nîsanê ve ev êriş dewam dikin. Ji dema destpêkirina van êrişan ve PDK'ê bi helwest û kiryarên xwe li cem dewleta tirkî ya dagîrker cih girtiye û li hemberî gerîlayên azadiyê bi artêşa Tirkiyê re ketiye nava tevgerê. Her çiqas rayedarên PKK û HPG'ê ji bo ku di nava Kurdan de şer dernekeve PDK şiyar kiribin jî, van demên dawî PDK'ê hêza xwe li pêşiya artêşa tirkî bir ser cihên gerîla û êrişî hêzên gerîla kir. Li gorî agahiyên hatîn girtin, di van êrişan de 2 gerîla şehîd



bûna û çarenûsa 3 gerîlayan jî ne diyar e. Li ser mijarê hevseroka Meclisa Malbatên Şehîdan ya bajarê Qamişlo Hêvî Seyîd got, planên dewleta tirkî ya dagîrker qirkirina gelê Kurd e, divê xelkê me vê baş bizanin, xwe bi rêxistin bikin û biparêzin.

**`Dijminê bava nabe dostê lawa`**


Hêvî Seyîd di dewama axaftina xwe de bal kişand ser piştgiriya PDK'ê ya Tirkiyê û got, divê hikûmeta başûrê Kurdistanê baş bizane ku dewleta tirkî gelê Kurd tev kiriye hedefa xwe, ne PKK tenê. Herwiha divê bizane ku dewleta tirkî li ser hesabê gelê wê, berjewendiyê



xwe dide meşandin. Divê hikûmeta başûrê Kurdistanê li dîrokê vegere. Gotina pêşiyan e: `Dijminê bava nabe dostê lawa.` Ango, dewleta tirkî dijmina gelê Kurd e. Banga me ew e ku, xelkê me yên başûrê Kurdistanê li dijî dagîrkirina Tirkiyê bêdeng nemînin.
Hêvî Seyîd axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Heta mirinê emê piştgiriya gerîlayên xwe bikin, lewra yên Kurd ji qirkirinê xilas bike ew in. Ev rastiyek e. Lê mixabin heta niha hinek xelkê me negihiştine wê rastiyê, ku PKK tine bibe, wê gelê Kurd tev tine bibe."

**'Li berxwedana gerîlayên azadiyê xwedî derkevin'**

Li ser heman mijarê endama Saziya Malbatên Şehîdan ya Qamişlo Suheyla Osman jî diyar kir ku, ti carî ji ser şopa şehîdên azadiyê venagerin û wiha dewam kir: "Xwedîderketina li gerîla xwederketina li Kurdistanê ye. Bila ti kes xwe nexapîne û nebêje gerîla (PKK) ji bo berjewendiyên xwe kar û xebatê dike. Cîhan tev gihiştiye wê baweriyê ku armanca PKK`ê rizgarkirina gelê bindest e, bi taybetî gelê Kurd. Berxwedan û têkoşîna gerîla ya li Herêmên Parastina Medya, vê rastiyê nîşan dide."
Suheyla Osman axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo pêkanîna xewn û xeyalên şehîdên azadiyê, em malbatên şehîdan heta dawiyê emê li ser şopa şehîdên xwe bin. Divê gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê, bi ruhê berxwedana gerîla û şehîdên azadiya çalakiyan li dar bixe. Çawa dijminê hov, ji bo qirkirina me bi şev û roj dixebite, divê em jî li hemberî planên wan bi şev û roj li ser piyan bin û bixwebitin. Heta xaka me di destê dagîrkeran de be, divê xew bi çavê me nekeve."



## Konferansa Jinên Rojhilata Navî û Bakurê Afrîka

**Zehra TUNÇ**

Konferansa 2. ya Jinên Rojhilata Navî û Bakurê Efrîka li paytexta Lubnan Beyrûdê bi beşdariya 100 delegeyên ji welatên weke Kurdistan, Iraq, Îran, Sûriye, Tirkiye, Misir, Tunis, Mexrib, Filistîn, Yemen, Ûrdun, Libya, Sudan û gelek welatên din, bi durişma "Bi yekîtiya jinan, emê şoreşa demokratîk pêk bînin" hat lidarxistin. Jinên ji gelek welatên cuda li hev kom bûyîn hem pirsgirêkên nava welatê xwe yên herî zêde dibin sedema şidet û kuştinên jinan, hem li hemberî wê hewldanên hatîn kirin bi hev re par kirin.
Piştî xwendina peyamên rêxistinên jinan, jinên mafê axaftinê girtîn li ser rewşa welatê xwe û no taybetî pirsgirêkên dibin sedema şidet û kuştina jinan nirxandin kirin. Meryem Zulfîkar ya ji Îranê beşdarî konferansê bûyî girêdayî rewşa jinan ya li Îranê û bi taybetî tengayiyên jinên li girtîgehên Îranê anîn ziman. Rojnamevana Sûdanî ya bi pirsgirêkên jinan re eleqedar dibe Madîha Ebdullah jî bi gotina; "Pirsgirêkên jinan yek in û ez bawer dikim ku doza bingehî doza welatîbûna jinan e" dest bi nirxandinê kir. Seroka komeleya Jinan Jîn ya Lûbnanê Buşra Elî jî Konferansa 1ê ya Jinên Rojhilata Navî ya 31'ê Gulana 2013'an li bajarê Amedê yê bakurê Kurdistanê hatî lidarxistin bîr xist û bal kişand ser têkoşîna jinan ya ji wê demê heta niha van deh salan kir û ji wê demê heta niha asta jinan xwe gihandiyê bi berfiherî nirxand.
Bi vî awayî ji despêkirina bihara Ereban ji Tûnisê heta şoreşa bi pêşengiya jinên Kurd li bakur û rojhilatê Sûriyê hatî lidarxistin di van salan de tecrûbeyên hatîn bidestxistin hemû hatin destgirtin û nirxandin.
Di roja duduyan de jî ji nava delegeyan sê komên cuda hatin hilbijartin û li ser sê mijarên bingehî xebat hat meşandin. Koma yekê li ser mijara astengiyên jinên Rojhlata Navî û Bakûrê Afrîka di aliyê siyasî û yasayî de pê re rûbirû dibin de nîqaş kirin. Koma duduyan li ser mijara hevsengiya jinan di herêmî û nêvneteweyî de bidin çêkirin, koma sisiyan jî li ser mijara bingehê sereke yê pêkanîna hevpeymana jinan nîqaşên berfireh kirin. Di dawiya rojê de xebata koman hat komkirin û xalên sereke yên derketîn pêş destnîşan kirin.
Dema pirsgirêkên nava welatan yên herî zêde bandorê li jinan dikin, dibin sedema şidet û kuştina jinan hatin nirxandin, hat dîtin li pirsgirêkên heyî ji hev ne cuda ne. Li welatan tevan heman rêgirî li pêşiya jinan heye. Ji ber wê jî di nirxandinên riyên çareseriyê yên ji bo ji niha pêve xebat çawa bê meşandin hatin kirin de herî zêde pêdivî bi hevpariya têkoşînê hat dîtin. Ji ber wê jî herî zêde nîqaş li ser hevpeymana jinan hat kirin û rêbazên wê yên xwegihandina hemû jinan bingeh hat girtin. Ji bo ev bikeve meriyetê pêşiniyarên şênber yên weke hê zêdetir bikaranîna online hatin kirin. Lewra jin dikarin ji hemû welatan xebatên xwe bi riya online bigihînin hev û bi hev re di nava danûstandinan de bin. Bi vî awayî wê têkoşîna jinan ya li deverên cuda bigihe hev û encamên mezin bigire.

# KCDK-E: Divê PDK dev ji hevkariya xwe ya bi dewleta tirkî re berde

KCDK-E bi daxuyaniyekê bang li PDK`ê kir ku dev ji hevkariya xwe ya bi dewleta tirkî re berde. Herwiha got, divê têkildarî koma gerîla ya agahî jê nayê girtin, daxuyaniyeke pêbawer bide.

KCDK-E têkildarî hevkariya Partiya Demokrat ya Kurdistanê (PDK) ya bi dewleta tirkî ya dagîrker re û bêdengiya wê ya derbarê rewşa koma gerîla ya li herêma gundê Xelîfanê ku agahî ji wan nayê girtin daxuyaniyek da.
Di daxuyaniya KCDK-E de ev bang hat kirin: ''Em Kurdên li Ewropa û dostên xwe bang li PDK'ê dikin ku dawî li hevkariya xwe ya bi dewleta tirkî re bîne û têkildarî koma gerîla daxuyaniyekek pêbawer bide ku agahî ji wan nayê girtin. Heta ku PDK daxuyaniyeke ku mirov pê bawer bike nede, wê di tevayiya çalakî û xebata me de, nêzîkatiyên me yên li hemberî PDK'ê her tim rexnegir bin, em ê li her derê û li her cihî pêvajoyeke riswakirinê bidin destpêkirin."
***ANHA***

## Haşim El-Cerba: Rêveberiya Xweser yekîtî ava kir û Sûriye xurt kir

**Ji şêxên eşîra Şemer Haşim Silêman El-Cerba diyar kir ku projeya Rêveberiya Xweser hêza Sûriyê parast û got, divê her kes wê mînak bibîne. Herwiha got, daxuyaniyên Şamê ne rast in û ji bo propagandaya çapemeniyê ne."**



Haşim Silêman El-Cerba doust kir ku tişta hikumeta Şamê nekirî Rêveberiya Xweser kir û got, QSD`ê bajarê Reqa û Dêrazorê ji rêxistina terorîst ya herî mezin DAIŞ`ê rizgar kirin û eweyî û aramî li herêmê misoger kirin.
El-Cerba ev li axaftina xwe zêde kir: "Li gorî pîvanan divê hikumeta Şamê xwediya parastina xaka Sûriyê be, lê li hemberî xaka Sûriyê ku ji aliyê DAIŞ`ê ve hatibû dagîrkirin erkê xwe pêk neanî. Eger Şamê parastina sivîlan û parastina erda Sûriyê bikira, wê giraniyek jê re çêbûya û Rêveberiya Xweser jî wê rêz jê re bigirta."
Haşim Silêman El-Cerba da zanîn ku Rêveberiya Xweser bi armanca parastina herêmê, parastina ewleyî û aramiyê wê, Kurd, Ereb, Suryan, Asûr û Êzîdiyan bi hezaran şehîd dan û cîhan şahida vê ye.
Haşim El-Cerba herwiha got, di demê de ku hikumeta Şamê ji derve dixwaze ku ji nû ve Sûriyê ava bike, Rêveberiya Xweser bê ku li hemberî vê daxwaziyê tiştekî bike, dest bi avakirina herêmên ji DAIŞ`ê hatîn rizgarkirin, kir û wiha domand: "Min ev di pratîkê de dît, mînaka wê jî Reqa, Dêrazorê û herêmên din in. Herwiha di qadên çandinî, bazirganî, ewlekariya hundirî de û rêzgirtina ji welatî û jinê re xebateke girîng da meşadin."
El-Cerba ev pirs kir: "Projeya Rêveberiya Xweser çawa Sûriyê lawaz dike? Tersê wê Sûriy xurt kir û rewşa wê baştir kir. Divê her kes modêla rêveberiyê wek mînak bigire, isbata vê jî ez li vir cihê xwe di nava rêveberiyê de digirim û dibêjin; ez sûrî me, nabêjim heskawî me yan jî reqawî me yan jî dêrî me."
Şêx El-Cerba da xuakirin ku ji daxuyaniyên Wezareta Karê Derve ya Sûriyê ya ku idîa dike ku Rêveberiya Xweser Sûriyê lawaz dike matmayî ye û wiha got: "Dewletên rojavayî û herêmî û dweletên dagîrkerên Sûriyê tev dizanin ku bakur û rojhilatê Sûriyê-Rojava li gorî herêmên din yên Sûriyê ya herî ewle ye, wê demê ka lawazî?"

**TI KESÎ RÊ LI PÊŞIYA HIKUMETA ŞAMÊ NEGIRTIYE KU EFRÎN, GIRÊ SPÎ Û SERÊ KANIYÊ RIZGAR BIKE**

El-Cerba ev li gotina xwe zêde kir: "Li vir li bakur û rojhilatê Sûriyê tişta ku kesên din nabîne em dibînin. Lewra em ewladên herêmê ne û li vir dijîn, me bajar rizgar kirin, şehîd dan û hê jî rojane li eniyên şer yên bi dagîrkeriyê re şehîdan didin. Ti kesî rê li pêşiya hikumeta Şamê negirtiye ku Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê rizgar bike û alîkariyê bide welatiyan"
Haşim Silêman El-Cerba herwiha got, divê Şam bi têgihîştin li Rêveberiya Xweser binêre û wiha domand: "Bi vê nêrînê wê tuyê nas bikî ku Rêveberiya Xweser ne Kurd tenê ne, rêveberên tê de cihê xwe digirin Ereb, Suryan, Asûr û Êzidî ne. Ango ji tevayiya gelan pêk tê. Ji ber wê dema Şam yan jî aliyên din xîtabî Rêveberiya Xweser dikin, ne xîtabî Kurdan tenê dikin, di heman demê de xîtabî tevayiya gelan dike."
El-Cerba da xuyakirin ku di demekê de ku Rêveberiya Xweser bang li hikumeta Şamê dike ku diyalogê dayne da li gorî şert û mercên welatîbûnê li hev bikin, divê hikumet xwe berpirsa xaka Sûriyê bibîne."
Haşim Silêman El-Cerba bang li hikumeta Şamê kir ku adil be û wiha gotina xwe bi dawî kir: "Li herêmê rewşa me baş e, em û hikumeta Şamê tev de vê dizanin, em dibînin ku mazot li benzînxaneyan heye, nan li firûnan heye, hêzên ewlekariyê parastina herêmê dikin da ku terorîst derbas nebin, di encamê de ev e ya ku ez wek welatiyekî dixwazim."
*(eh)*
***ANHA***

## Pault t.Calvert: Koalisyona Navneteweyî destekê dide QSD`ê

**Fermandarê Hêza Erkên Hevbeş-Operasyona Ezim El-Selib general Paul t.Calvert teqez kir ku hevkariya di navbera Koalisyona Navneteweyî û QSD`ê de dewam dike û got, Koalisyon ji sedî sed destekê dide we û QSD`ê."**

Fermandarê Hêza Erkên Hevbeş- Operasyona Ezim El-Selib general Paul t.Calvert di axaftina xwe de ji ber rola wê ya di têkbirina DAIŞ`ê de spasiya QSD`ê kir û got, ji min re cihê serfiraziyê ye ku ez li pêşiya wan kesên ku parastin kirin û berdêlên mezin li dijî DAIŞ`ê dan, biaxivim."
Pault t.Calvert di civîna salane ya meclisên leşkerî yên QSD`ê de ku li bajarê Hesekê hat lidarxistin, diyar kir ku DAIŞ li erdê bi dawî bû ew jî bi hevkariya di navbera koalisyon û QSD`ê de ye.

**'HEVKARIYA BI QSD`Ê RE DIDOME'**

Pault t.Calvert di axaftina xwe de ev xal anî ziman: "Hevkariya me bi QSD`ê re wê dewam bike heta ku DAIŞ têk biçe. Par me destkeftiyên mezin bi dest xistin. Bi hev re me sivîl parastin. Hêzên me di gelek pêngavan de destek dan QSD`ê. Ji wan, pêngava Holê bû ku bû sedema têkbirina hêza DAIŞ`ê. Vê pêngavê hişt ku em şaneyên DAIŞ`ê di kampê de nas bikin."
Pault t.Calvert axaftina xwe wiha domand: "QSD`ê destek da ewlekirina girtîgehan û rê neda ku çeteyên DAIŞ`ê birevin. Armanc ew e ku em projeyên din jî li dar bixin da ku xetera DAIŞ`ê li dijî hevalbendên me têk bibin.
General Pault t.Calvert da zanîn ku di mehên borî tiştên li herêmê dibin, rewşa kampan û rewşa aborî, gihandine civaka Ewropa.



Pault t.Calvert di berdewamiya axaftina xwe de wiha got:" Em dixwazin hûn bizanin ku koalisyon ji sedî sed destekê dide we û QSD`ê.
***ANHA***



## Di dîrokê de 3'yê Tebaxê û 15'ê Tebaxê

**Ahmet Aktaş**

Di vê heyvê de jî du bûyer, du rûpel ketine nava dîrokê. Rûpelê 3'yê Tebaxê rûpelekî reş e; tijî zulum, zor, zehmetî, xwîn, xwêdan, keser, keder û tijî xiyanet e. Rûpelê 15'ê Tebaxê rûpelekî spî; tijî berxwedan, serîhildan, tolhildan, curet, cesaret, keramet, hêvî, xweşdivî, wekhevî, bawerî û tijî daxwaziya jiyana mirovayî û xweserî û azadî ye.
Ji bo fermana 3'yê Tebaxa 2014'an ya li ser gelê me yê Êzîdî, hinek dibêjin fermana 73'yan, hinek jî dibêjin fermana 74'an. Ewqas zêdê ferman hatine serê gelê Kurdistanê, êdî jimar tên jibîrkirin. Bêguman êrişên ser gelê me yê Êzîdî, hem pirtir in hem jî taybetir in.
Lewra xwediyê ola resen yê herî dîrokî yê gelê Kurdistanê ye û xaka lê dijîn jî herwiha herî dîrokî û pîroztir e. Êdî ev taybetmendî, hema ji hêla her alî ve tê pejirandin. Herwiha ev jî tê zanîn ku armanca dewletên dagîrker û nexasim ya dewleta tirkan, jenosîda Kurdan e û ji ber ku reha wê/koka wê jî ev ol û ev xak e, êrişa sereke û girantir jî li ser vir e.
Niha, bi fermaneke nû ya Bexda-Hewler-Ankara ya 9'ê Cotmeha 2020'an imze kirin, vê armanca xwe dewam didomînin! Berî vê fermanê jî êrîşên wan ne rawestiyabûn, bi taybetî bi şehîdkirina Mam Zekî Şingalî re, zemînê vê fermana fermî amade kirin.
Em hema derbasî bûyera duduyan; Pêngava 15'ê Tebaxê bibin û têkiliyên her du bûyeran şîrove bikin. Ev pêngav, 15'ê Tebaxa 1984'an hat avêtin. Biryara vê Pengavê, li ser berxwedana lehengî ya Zîndana Amedê hat dayîn. Helbet divê neyê jibîrkirin, yê ev ruhê berxwedêr yê zîndanê anî derve û hevalê xwe li ser wê perwerde kirin, ew tirsa faşîzma dewleta tirka ya Derbeya 12'ê Îlonê ji mejî û bedena wan derxist, li şûna wê curet çand û bi vê îradeya xurtkirî vegerand Kurdistanê û karî vê êengava dîrokî bide despêkirin; Rêber APO bû.
Herwiha ev ruh û ronahiya mejiyê hemdem, bi vê pengavê re, derbasî gelê Kurdistanê û gelê herêmê jî bû. Ev ruhê tirsşkandî, di nava Tevgêrê de û bi giştî di nava gel de ewqas bi xurtî cih girt, êdî ew zihniyeta kevnar ya koletî û xulamtiyê nema bikare xwe li ber wê ragire. Lewra vê Tevgêrê, hêza xwe ji bîrûbaweriya Rêber û Şehîdên xwe distand, pişta xwe nedispart hêzen biyanî, pişta xwe dispart îradeya xwe û gelê xwe yê bi hesreta azadiyê.
Êdî dor dora tolhildanê bû. Weke Pengava Tolstandinê, gav bi gav ket pey tolhildana wan qirkirin û xiyanetên dîrokî yên Agirî, Zîlan, Amed, Dêrsim, Çarçira, Aşbetal, Sînema Amûdê û hwd.
Ka em têkiliyên vê êengavê û frmana 3'yê Tebaxê bibînin.. Ev ruh û zihniyeta tolhildêr, ma dikaribû li hember vê fermana qirkirina gelê me yê Êzîdî, temaşevan û bêdeng bimîne? Nexêr, hem ji Rojava û hem ji Qendilê bi lezgînî, weke siwarên Dewrêşê Evdû çûn hawara gelê xwe yê Êzîdî. Eger bi sedhezaran insanên me ji vê fermanê hatibin rizgarkirin û pêşî li jenosîda tevayî hatibe girtin, encama çûna hawara wan lehengên vê Tevgera cangorî û tolhildêr; YPG, YPJ û HPG'ê bû.
Dermanê tevayiya ferman û jenosîdan, bîrûbawerî û ruhê Pêngava 15'ê Tebaxê ye. Li ser vî bingehî gelek deskeftiyên birûmet yên gelê Kurdistanê hene. Herwiha gelek plan, niyet û êrişên xerab û bixeter jî hene. Bi tenê, dermanê rizgariya ji van xeteran; giyan û viyan û berxwedana Pengava 15'ê Tebaxê ye!



# Mezlûm Ebdê: Vegerandina koçberan erkê me yê sereke ye

Mezlûm Ebdê careke din soz da ku wê koçberan vegerînin herêmên wan û têkoşîna li dijî DAIŞ`ê bidomînin. Herwiha got divê li ser asta navneteweyî piştgiriya QSD`ê bê kirin da erkên xwe bîne cih.



Fermandarê Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di civîna salane ya meclisên leşkerî yên QSD`ê de axivî. Herwiha di civînê de fermandarên hêz û meclisên leşkerî yên bakur û rojhilatê Sûriyê, şandeya Koalisyona Navneteweyî û rayedarên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê beşdar bûn.
Mezlûm Ebdê di axaftina xwe de diyar kir ku piştî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bi gelek astengî û zehmetiyan re rûbirû mane û axaftina xwe wiha domand: "Bi saya ciwanên gel me û hêzên dost, ev astengî derbas kirin."
Ebdê da zanîn ku hû xetera DAIŞ`ê heye û wiha axivî: "Divê cîhan û şirîkên me yên navneteweyî piştgiriya ku didin me bidomînin da ku em rê li êrişên ser herêmên me bigirin."

**'BI RÊBAZÊN LEŞKERÎ TENÊ DAIŞ TINE NABE'**

Ebdê di dewama axaftina xwe de wiha got: "Di vê pêvajoyê de rêbazên leşkerî tenê têrê nakin ku DAIŞ tine bibe. Divê binesaziya wêrankirî were pêşxistin. Divê şert û mercên jiyanî yên welatiyan werin başkirin. Divê têkoşîna li dijî DAIŞ`ê dewam bike da ku bi temamî tine bibe. Ji bo wê divê li ser asta siyasî, civakî û xizmetgûzarî piştgiriya Rêveberiya Xweser were pêşkêşkirin."
Ebdê bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) kir ku riyan bibînin ku alîkariyê bigihînin herêmê û axaftina xwe wiha domand: "Bi hezaran girtiyên DAIŞ`ê û malbatên wan li herêmê ne. Hemû dizanin ku derfeta Rêveberiya Xweser têrê nake ku tenê bi vê dosyayê re mijûl bibe. Ji bo pêşxistina rewşa girtîgehan û kampan heta ku ew kes vegerin welatên xwe, divê civaka navneteweyî piştgiriyê bide."
Ebdê bal kişand ser guhertina demografiya herêmên dewleta tirkî dagîr kirine û got, guhertina demografiyê bênavber dewam dole. Herwiha divê koçber vegerin warên xwe.
Ebdê diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker rojane agirbestê binpê dike. Herwiha da xuyakirin ku hevkariya wan ya bi hêzên Rûsya re ya ji bo parastina agirbestê li sînorên bakur dewam dike.
Ebdê dubare diyar kir ku QSD amade ye bi tevayiya aliyên ku dixwazin aloziya Sûriyê çareser bibe re diyalogê dayne û wiha dewam kir: "Em bi diyalogê, agirbest, diyaloga sûrî-sûrî, çareseriya siyasî û çareserkirina pirsgirêkên bi hikumeta Şamê re ne. Divê peyama me şaş neyê fêmkirin. Daxuyaniyên hikumeta Şamê yên têkildarî hêzên me nayên qebûlkirin û nakevin xizmeta sûriyan. Hêzên me bi xiyanet û parçekirina welêt sûcdar dike. Em ji wan re dibêjin, we ev herêm ji DAIŞ û komên terorîst re hiştin. Hêzên me ne ku ev herêm rizgar kirin û parastina gel dikin.
Ebdê di dewama axaftina xwe de wiha axivî: 'Em bi nasnameya xwe ya sûrî serbilind in. Tevayiya hêzên di binê sîwana QSD`ê de bi vû serfiraz in. Di civîna berê de me biryareke girîng girt ku sazûmaniya QSD`ê biguherînin. Lê ji ber êrişên dewleta tirkî û pandemiya koronayê ev biryar û gelek biyarên din pêk nehatin."
Ebdê di dawiya axaftina xwe de pêwîstiya pêşxistina QSD`ê destnîşan kir û got, di vê civînê de emê hewl bidin gelek biryaran bigirin ku pêkanîna biryarên berê misoger dikin. Emê saziyên leşkerî pêş bixin, behreyên wê zêde bikin, xebata rêveberî û leşkerî pêş bixin da ku DAIŞ`ê bi temamî tine bikin, herêmên dagîrkirî rizgar bikin û ewleyiyê li Sûriyê bi giştî pêk bînin."
Paşê fermandarê Hêza Erkên Hevbeş-Pêngava El-Ezem El-Selib Paul t. Calvert, hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Emîne Omer û Ebid Hamid El-Mihbaş bi navê Rêveberiya Xweser axivîn.
***ANHA***

## Bedran Çiya: Têkiliya Rêveberiya Xweser bi gelek welatan re pêş dikeve

**Bedran Çiya Kurd diyar kir ku têkiliya Rêveberiya Xweser bi rêveberiya nû ya Amerîka û gelek welatên Ewropa re pêş dikevin.**

Rêxistina Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) ya Almanya li bajarê Frankfurtê civînek li dar xist.
Di civînê de cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Bedran Çiya Kurd mijarên girêdayî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û têkiliya Rêveberiya Xweser bi derve re nirxandin.



Çiya Kurd diyar kir ku têkiliya Rêveberiya Xweser bi rêveberiya nû ya Amerîka û gelek welatên Ewropa re pêş dikevin û got, ev alî êdî bi awayekî rasterast bi rêveberiyê re danûstandinê dikin û hewl didin van têkiliyan bi herêmê re fermî bikin.
Bedran Çiya Kurd rewşa siyasî û leşkerî ya bakur û rojhilatê Sûriyê, sûcên li herêmên ji aliyê dewleta tirkî û çeteyên wê ve hatîn dagîrkirin nirxandin. Herwiha got, divê kurdên li Ewropa di eşkerekirina van sûcan de rola xwe bilîzin.

**TIRKIYE KURDAN DIKE HEDEF**

Çiya Kurd bal kişand ser rola Tirkiyê ya li herêmê û wiha got: "Êdî armanca dewleta tirkî ji her kesî re eşkere ye. Her kes dizane ku Tirkiye gelê Kurd û her projeya demokratîk li Rojhilata Navî dike hedef."

**'LI HEMBERÎ PLANÊN TIRKIYÊ DIVÊ TÊKOŞÎN BÊ KIRIN'**

Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser banga têkoşînê li hemberî planên dewleta tirkî ya dagîrker kir û got, ev têkoşîn ji bo her kurdê welatparêz li cîhanê girîng e."
Çiya Kurd bi domdarî wiha got: "Hinek aliyên Kurdistanî di têkiliyên xwe yên bi Rêveberiya Xweser re ne zelal in û têkiliyên xwe bi dijminên Kurdan re pêş dixin. Ev siyaset xizmeta Kurdan nake. Ji bo gelê Kurd xetên sor hene, ev xet ji her kesî re zelal in, nabe ti aliyên Kurd bi dewleta tirkî re weke dewleteke dost bide û bistîne. Lewra dewleta tirkî li Efrîn, Serê Kaniyê, Girê Spî û herêmên din dixwaze Kurdan tine bike."
Bedran Çiya Kurd di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser xebata domdar ya Rêveberiya Xweser ya ji bo gelên herêmê û pêşxistina rêveberiyê. Her wiha bang li kurdên li Ewropa kir ku ji bo pêşxistina vê rêvebriyê destekê bidin.
***ANHA***

## Li dijî Kurdan êrişên nijadperestî



**Zekî BEDRAN**

Êvara 30yê Temûzê li navçeya Konya Meramê malbateke Kurd hat tinekirin. Ji çar kesên hatîn kuştin çar jin bûn. Berî hingê bi çend rojan jî li sê bajaran nijadperestan êrişî Kurdan kiribû û kesek hatibû kuştin. Belavbûna van êrişan ne tesadûf e. Berî niha jî li Izmîrê kujerê ketî avayiya HDPê Deniz kuştibû. Agahî girtibûn ku wê wê rojê mirov li wir pir bin. Ji ber wê bi zanebûn çûbûn û plana êrişeke berfireh kiribûn. Dema em li van rêzebûyeran binêrin eşkere ye ku yên bûyîn hedef tev Kurd in. Malbata li Meramê hatî tinekirin meha Gulanê jî êrişî wê hatibû kirin. Êrişkar hatibûn parastin û ji aliyê 'edaleta tirkî ya pîroz' ve hatibûn berdan. Kurdên bûyîn hedef tev mirovên bêsûc in. Sedema sereke ku bûne hedef Kurdbûna wan e. Rêveberên dewleta tirkî Bahçelî û Erdogan her tim dijminiya Kurdan dikin û dikin hedef. Bi ragihandina destê xwe de jî hem dibin dozger, hem dadger û hem kujer. Kurdan dikin dijmin û wan di nava terorê de nîşan didin.
Weke di bûyera li Meramê de eger malbateke Tirk tine bibûya wê Bahçelî, Erdogan û ragihandina tirkî ya nijadperest çi bikiran? Em bihizirin. Eger li welatekî Ewropa bûyereke wiha bihata serê malbateke tirk wê qiyamet rakirana. Ne nijadperestia ewropiyan ne dijminiya islamê dima. Lê ji ber ku plan û komkujî yên wan in heta dikarin naxin rojev, yan jî weke bûyereke sivik derbas dikin. Ev jî nîşana wê ye ku nijadperestî û komkujî bi destê dewletê tên birêxistinkirin.
Naziyan Cihû çawa tine kirin? Ittîhatiyan û yên pişt wan re Ermen, Asur, Suryan, Rûm, û Cihû çawa tine kirin? Sabri Yirmibeşoğlu bi pesindarî diyar kir ku êrişên ser Rûman yên 6-7ê Îlonê li Stenbolê ji aliyê Daîreya Şerê Taybet ve bi serkeftî hatine kirin. Eger em bala xwe bidinê di van qirkirin û komkujiyan tevan de dewletê ragihandinê jî bi kar tîne û rayagiştî amade dike. Ragihandin qurbanan xerab nîşan dide û hişmendiya ku mirin û talan heq kirine di nava civakê de bi cî dikin.
Bi salan e dibêjn Kurd cudakar û terorîst in. Gotinên bibandor yên nefretê bi kar tînin. Li seranserê dinyaê nijadperestî sûcê li hemberî mirovayiyê hatiye qebûlkirin û kiryarên wê tên cezakirin. Lê li Tirkiyê nijadperestî bi destê dewletê tê kirin û ceza jî nîne. Mînak dadgehên Tirkan biryar dan ku gotinên kesekî weke Sedat Peker 'Emê di xwîna rewşenbîr û dijberên desthilatdariyê de xwe bişûn' dikevin çarçoveya azadiya fikir. Rewşenbîrên welatî, akademîsyen û xebatkarên çapemeniyê ku di zindanan de ne, Tirkiye ji bo yên weke Peker weke buhiştê ye.
Li Tirkiyê axaftina kîn û nefretê pir belav e û di asta xeterê de ye. Dijminên sereke Kurd in. Ev tê zanîn. Lê di serî de Ereb koçber di hedefa van êrişan de ne.
Bilindiği gibi savaşlar da kurallara bağlanmış. Bunun için 2. Dünya savaşından sonra Cenevre sözleşmesi hazırlanmış. Bu sözleşmeye göre sivillere saldırlar, kimyasal silahlar, talan ve tecavüzler, işkence vb eylemler yasaklanmış. Türkiye devleti de bu sözleşmeyi imzalayan devletler arasında. Ancak buna uymuyor. Kürdistan'da binlerce köy yaktılar. Faili meçhul adı altında binlerce cinayet işlediler. Tecavüz, işkence ve hukuksuzluklar dizginlerinden boşanmış durumda. Kürtlerin dili, kültürü ve adı yasaklı. Meram'da katledilen ailenin Kürt olduğunu bile yetkililer ağzına almıyor, basını aynı durumda.
Di dîrokeke nêzîk de 1ê Gulanan 1977an komkujiya Taksimê, komkujiya Çorumû Mereşê, komkujiya Sêwasê, komkujiya Roboskê çêbûn. Ku em bala xwe bidinê qurbanên komkujiyan kedkar, Kurd û Elewî ne. Yên dewlet wan ji bo qubanê dike hedef, kesên wisa ne ku tam bi Tikên serdest re entegre nebûne.
Eger dewletê organîze nekiribûya bi milyonan Cihû li Ewropa li gund û bajaran nedihatin komkirin nedibirin kampên mirinê. Ermen jî wisa. Eger ne wisa bûya heta beriya Dêrazorê hestiyên milyonek Ermen belav nebûna. Wê li Dêrsimê bi dehhezaran Kurd nehatibûna tinekirin. Ev mirov bi awayekî girseyî hatin komkitin û tinekirin. Bê ku bêjin ev jine, zarok e xwestin koka gelan biqelînin. Bi çi awayî bê nirxandin li holê sûcê li dijî mirovayiyê, ango qirkirin heye. Erdogan dibêje ecdadên min tiştên wiha nakin. Kî ji vê gotinê bawer dike? Ew bixwe bi pesindarî dibêje me bi dehhezaran Kurd li Efrîn, Sûr, Nêsêbînê û deverên din kuştin. Niha karê herî baş yê dike kuştin, roxandin û şewitandin e. Vî karî weke ecdadên xwe bi awayekî hovane dike. Ji bo wê divê gelê Kurd, hêzên demokrasiyê û gelên herêmê li hemberî van zordest û qirkeran deng û hêza xwe bikin yek.